# Nameya Zeyneb Celaliyan: Tu bi işkenceyê nikarî jinan bidî sekinandin

Girtiya siyasî ya Kurd Zeyneb Celaliyan ku 15 sal in li Îranê di girtîgehê de ye û di dema destgîrkirinê de gelek danûstandinên dermirovî derbarê wê de hatibûn kirin û heta niha veguhestine gelek zindanan, herwiha destûa hevdîtina bi malbatê re nadin, ji bo 8'ê Adarê nameyek nivîsî.

Zeyneb Celaliyan di nameya xwe de behsa işkenceya ku li Girtîgeha Istîxbarata Sepahê ya Kirmaşanê dîtiye, kiriye. Nameya Celaliyan wiha ye:

"8'ê Adarê li dayîka xwe, jinên ku çavrêyên hezkiriyên xwe ne û li hemû jinên cîhanê ji dil û can pîroz dikim. Dema em li dîrokê dinêrin, em dibînin ku jinên azadîxwaz her tim li dijî rejîmên dîktator li ber xwe dane û ev jinên leheng 8'ê Adarê bi xwîna xwe derbasî dîrokê bûne. Ey zalim, ma hûn nabînin! Hûnê nikaribin daxwaziyên me yên jinan bi komkujî, işkence û zindanan asteng bikin. Dema jin dest bi rêwîtiya xwe ya azadiyê dike, ti zext nikarin wê ji rêya ku berê xwe dayiyê, paşve vegerîne.



**'Ez rastî işkenceyên giran hatim û tişta ku ji min re mayî ramanên min in'**

Dema ku ez di destê zordarên Komara Islamî de bûm, min ev his kir:

Cilûbergên min çirandin, çavên min girtin, dest û lingên min bi zincîran girê dan û ez rastî işkenceyên giran hatim. Qamçiyê di bin lingên min de, lingên min werimandibûn û pir diêşiyan. Ez ewqas diêşiyam ku êdî min êşa xwe his nedikir. Tevahiya laşê min bêrih bûbû, êdî min nikariya bedena xwe kontrol bikim, pantolonê min şil bibû.

Erê heyf e, lê ew kesên ku ev kareseta bi serê min de anîn, ez nas nakim. Ey wijdanên şiyarbûyî! Mafê we heye ku hûn wan kesan sûcdar bikin, ji bilî azadî û wekheviya mirovan daxwaziyeke din nîne. Wan sûcdar bikin, ez berî deh salan ne wisa bûm. Dema işkencekaran işkence li min dikir; tenê ramana min, baweriya min, hêviya min ya ji bo jinên têkoşer û heviya paşrojê mabû. Ku ez bibêjim pênûs nikare derdê min binivîse, ez mezin nabim, ji ber ku min beşeke piçûk ji işkenceya li ser xwe ji we re got. Ez hêvî dikim ku îro hemû jin bi awayekî watedar bigihîjin azadiya xwe.

**'Werin em bi hev re li dijî dagîrkeran têbikoşin'**

Ez carna difikirîm ka ez li kû dera cîhanê me, an li kû derê di dema xwe de asê mame. Ez çiqasî hewl didim ez bersivê nabînim. Ma ev e mafê min? Şahidiya daleqandina welatî û xizmên xwe û nefesnegirtin e? Şer, nefret, durûtî, kuştin, işkence di dema herî normal de diqewime û zalim ji bo her sûcî sedemek an hincetek heye û ji bo min ya herî bi êş ev e. Ey jinên leheng û fedekar, bêjin agir dudilî ye! Ez mirinê ji kesî re naxwazim, heta ji zaliman re jî. Werin em bi hev re li dijî zaliman têbikoşin da ku zaliman ji welatê xwe derxîn in. Ji bo em li hemberî jinên ku sibe jiyana xwe ji dest bidin, şerm nekin. Divê em berdêla azadî û wekheviyê bidin.

**'Ez wêrektir im û li hemberî işkenceyê berxwedêr im'**

Ez Zeyneb im, Zeyneb Celaliyan. Ez jineke Kurd im ku bi sedan sûcên Komara Islamî di zindanan de, bêbextî, piçûkxistin, işkencekirin û ji hemûyan xerabtir min şahidiya daleqandina 10 hevalên xwe yên girtî kiriye. Ma êşeke ji vê mezintir heye! Ev zalim tenê dixwazin ez poşman bibim. Ez çawa dikarim ji bîr bikim van işkence û zordariya ku ez tê de derbas bûme? Bawer bikin, zalim çiqas zulm û işkenceya li ser min zêde bikin, ez ewqas leheng û berxwedêr dibim."

# 'Sîstemeke ku jin tê de bênirx be ava kirine'

Navenda Nûçeyan-Qamişlo

**Li başûrê Kurdistanê kuştin û xwekuştina jinan rojbiroj pirtir dibe. Çalakvanên jin yên Başûr gotin, sîstemeke ku jin tê de bênirx be ava kirine û bi navê namûsê kuştina jinê bûye karekî asayî.**

**Li Başûr kuştina jinan bênavber didome**

Sala 2022`yan jî li başûrê Kurdistanê kuştina jinan ranewestiyaye. Li gorî şopandina heyî, ji destpêka salê heta niha, ji aliyê mêran ve 15 jin bi awayên herî hovane hatine kuştin. Herî dawî 7'ê Adarê, çalakvana jin Marya Samî li Hewlêrê bi destê birayê xwe hat kuştin. Li gorî amarên Saziya Parastina Jinan ya girêdayî Hikumeta Herêmê sala borî, 24 jin hatine kuştin, 61 jinan xwe kuştiye û 86 bûyerên xweşewitandin û şewitandinê çêbûne. Lê li gorî çalakvanan ev jimar ne rast e ji wê pirtir e.

**`Sîstema sûc û tundiyê li dijî jinan ava kirine`**

Têkildarî pirbûna sûcên li hemberî jinan li başûrê Kurdistanê parêzer û çalakvana serbixwe ya projeya `JIN JIYAN E MEKUJE` Çiro Şewanî, ji me re wiha got: "Sûcên li hemberî jinan, li seranserê cîhanê, nemaze li Rojhilata Navî ji ber hişmendiya mêr ya desthilatdar, zêde dibin. Lê li başûrê Kurdistanê bi awayekî eşkere, li ber çavên me rojbiroj ev kiryar zêde dibin. Li Başûr bingeh û sîstemeke wisa hatiye danîn rê dide ku sûc û tundiya li hemberî jinê pirtir bibin. Vê rewşê jî bi xwe re qeyranên exlaqî, siyasî, perwede û aborî ku destê desthilatê di navê de ye, anîne. Ji aliyekî din ve, ji milê dijminên civakê ve êrişeke mezin li ser nirxên civakê û jinê tê kirin. Jinê bi kar tînin û weke amûreke bazirganiyê nîşan didin. Di encamê de sûcên li hemberî jinan ji çarçoveya bûyeran derketine û bûne diyardeyeke rojane."



**`Bi navê azadiyeke qelp, di binê navê `jina modern` de jinê bênirx dikin`**

Çiro Şewanî herwisa diyar kir ku bi navê azadiyeke qelp û di binê navê `jina modern` de jinê bênirx dikin û axaftina xwe wiha domand: "Di nava civakê de hebûna jinê weke namûsa mêr hatiye dîtin. Ji ber wê civak kuştina wê karekî asayî dibîne. Jixwe li başûrê Kurdistanê jin û civakeke bêmaf hene. Lê desthilat dixwaze nîşanî cîhanê bide ku jin xwedîmaf e û bi rola xwe ya biryarê dilîze. Lê ev xapandin e, dema ez bêm kuştin û şewitandin ka mafên min?

**`Desthilat rexnegiran bi terorîstî bi nav dike`**

Parêzer Çiro Şiwanî diyar kir ku amarên sûcan yên rast, ji aliyê desthilatê ve tên veşartin û ev agahî dan: "Li başûrê Kurdistanê qaşo rêveberiyeke kurdî heye. Ev desthilat dema ji ber rewşa jinê tê rexnekirin, red dike. Li hemberî çalakvan û rexnegiran desthilata xwe bi kar tîne; bêbextiyan dixe stûyê wan. Yek ji wan Bêrîvan Eyûb e -ku destûra Iraqê û Hikûmeta Herêmê mafê rexnekirinê dayînê- ku rexne û banga wê ji bo qutkirina berhemên tirkî ji bazarên herêmê bû. Lê ew û gelek çalakvanên jin bi van helwestên xwe yên azadîxwaz ji aliyê desthilatê ve wek xayîn, sûcdar û terorîst hatin sûcdarkirin. Herwiha hatin destgîrkirin û bi salan li zinadanan bêdarizandin dimînin. Jixwe piraniya girtiyên niha li başûr çalakvan, nivîskar û rojnamevan in. Helwesteke din ya desthilatê heye, ew jî kuştina çalakvanan e ku bi dehan rexnegir ji aliyê desthilatê ve tên revandin û kuştin. Lê ya terorîst, xayîn û erdê Kurdistanê difroşe biyanî û dagîrkeran, desthilat bixwe ye."


**`Rêxistinên jinê yên girêdayî desthilatê ji bo doza jinê çi dikin?`**

Parêzer Çiro Şiwanî herwisa diyar kir ku Rêxistinên Jinan yên girêdayî desthilatê hene, lêbelê nûnertî û parastina mafên jinê nakin û derveyî berjewendiyên desthilatê naxebitin. Lê ji bo xapandina civakê car caran, rexneyên şermoke û bêbandor dikin. Ez û her jina li Başûr ji wan dipirsin, ev jinên di nava desthilatê de ji bo doza jinê çi karî dikin?

**` Li Başûr pêdiviya jinê bi şoreşeke hizirî heye`**

Ji bo çareserkirin û kêmkirina sûcên li hemberî jinan çalakvana projeya `JIN JIYAN E MEKUJE` Çiro Şiwanî wiha axivî: "Li başûrê Kurdistanê di qada civakî de pêwîstî bi şoreşa jinê ya hizirî heye, ku civakê hişyar bike û xwe ji şerê taybet biparêze. Jin jî ji bo azadiya xwe ya rast têbikoşin. Lewra dema jin hebûna xwe nas bike, wê xwe biparêze û li ser rûyê erdê ti hêz nikaribin wê bêmaf bihêlin. Herwiha divê ji qonaxa seretayî heta zanîngehê materyalên perwerdeyê li ser rastî û pîroziya jinê bin û civak li gorî wê îdeolojiyê were perwerdekirin. Herwisa divê jinên Başûr ji ezmûn û xebata jinên Rojava û bakurê Kurdistan sûdê bigirin. Lewra li wir li hemberî sûc û hişmendiya paşverû jinan mil dida hev, têkoşiyan û li dijî çeteyên herî hovane jî têkoşiyan û pergaleke azad û bedew afirandin."

**`Karê dadgehê bi destwerdanê şêlo û biguman dibe`**



Li ser heman mijarê parêzera şêwirmend Hawjîn Ehmed ji me re axivî û ev agahî dan: "Li dadgehan vê demê tomarkirina giliyan ji aliyê jinên li hemberî wan sûc hatî kirin ve zêde dibe. Ev jî hem zêdebûna diyardeya tundiyê li hemberî jinan, hem xurtbûna hişmendiya jinan ya parastina mafên xwe nîşan dide. Jixwe tê zanîn ku li Iraqê û başûrê Kurdistanê qanûna (Jimar 8/2011) parastina jinan û misogerkirina mafên wan heye, -ku bi têkoşîna jinan hatiye danîn-, lê pêk naynin. Ji ber wê sûcdar ji cezayê xwe rizgar dibe."

Hawjîn Ehmed wiha dirêjî da axaftina xwe: "Li gorî qanûna Iraqê darizandina kujeran li dadgehê eşkere tê kirin û mafê her kesî heye beşdarî darizandinê bibe. Lê mixabin têkiliya bi berpirsên payebilind yên desthilatê re û destwerdana wan, bandorê li karê dadgehê dike û bêalîbûna dadgehê namîne. Di encamê de sûcdar li gorî qanûnê nayê cezakirin, yan jî bi lêborînên giştî tê berdan."



# Va ye stirana Newroza 2022'yan: Agirê Newrozê hilke

Stirana Newrozê ku wê îsal bi dirûşma "Dem dema serkeftinê ye" bê pîrozkirin eşkere bû.

Starta Newroza îsal ku wê bi dirûşma "Dem dema serkeftinê ye" bê pîrozkirin, li Amedê bi pêşengiya Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Tevgera Jinên Azad (TJA), Partiya Herêmên Demokratîk (HDP) û Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û bi tevlîbûna partiyên ku di nav Koma Xebata Tifaqa Kurdistanê de cih digirin bi deklerasynekê hat dayîn.

Di bernameya deklerasyonê de danasîna stran û qlîba Newroza 2022'yan hat kirin. Gotinên strana "Agirê Newrozê hilke" ji aliyê Mihemedê Pirosî ve hatine nivîsandin û wiha ne.

"Bihar ket Kurdistanê, hêlîna teyrê baz î

Li erdê şêr û piling, her dem bi gav û bez î

Li ser sînga Zagrosan, tu zinar lat û raz î

Li dor agirê Newrozê, tu stran tu awaz î

Hay hilke hilke hilke agirê newrozê hilke

De gurke gurke gurke agirê pîroz e gurke

Bihar ket xwezayê, tu baz î tu şahîn î

Li çar kenarê welat, nobedar parêzvan î

Tu şêrejina çeleng, cotê kezya dihejînî

Li dor agirê Newrozê, strana xwe dixwînî

Hay hilke hilke hilke agirê newrozê hilke

De gurke gurke gurke agirê pîroz e gurke"

MA




# Dengekî nejibîrkirî: Hozan Dilgeş

**Hozan Dilgeş bi berhemên xwe di nava hunera kurdî de ji xwe re cihekî mezin çêkir. Hozan Dilgeş di salvegera koça xwe ya dawîn de tê bibîranîn.**

12ê Adarê salvegera wefata hunermend Dilgeş bû. Hozna Dilgeş di 12'ê Adara 2017'an de jiyana xwe ji dest da. Dilgeş bi berhemên xwe berxwedana destanî ya gelê Kurd vegot û bû hunermendekî gel. Dilgeş di sala 1952'yan de li gundê Fisqînê yê Nisêbinê ya Mêrdînê ji dayik bûye. Ji malbeteke pîran a êzidiyan e. Hê di zarokatiya xwe da hînî tembûrê bû. Dema Dilgeş 14 salî bû, li herêma xwe muzîkjenekî naskirî bû.

Dilgeş di sala 1979'an de neçar ma sirgûnî Almanyayê bibe. Bi tevahî 9 kaset çêkirin û di jiyana xwe de nêzî hezar gotinên stranan nivîsandin.

Di hevpeyvîneke me ya di sala 2006'an de, xeta xwe ya rewşenbîrî wiha rave kiribû: "Ez mirovekî welatparêz û sosyalîst im. Ez ji dîktatoriya proleter bawer dikim. Dema min stranên xwe nivîsandin, ez li ser vê xetê bûm."




Yek ji stranên Dilgeş ên salên 1990'î ku li Kurdistanê herî zêde dihat gotin, strana "Muxtaro" bû. Di wê stranê de cerdevan û mixtarên gundan rexne kirin. Hunermend Dilgeş neçar ma bi dehan salan li sirgûnê bijî. Nikarîbû biçe warê xwe ku lê ji dayik bûbû û mezin bûbû. Hesreta xwe ya ji bo Nisêbînê di stranan de digot:

Ax Nisêbîn warê delal
Min tu nedî ev bû çend sal
Li ser tene destê gemar
Ev dilê min bû birîndar

**Li ser rêber ocalan stran gotin**

Du stranên hunermend Dilgeş ku heta niha li tu derê nehatine weşandin, li ser rêber Abdullah Ocalan in. Yek ji van li ser roja 15'ê Sibata 1999'an e û bi navê "Ferman" e. Hunermend êşa xwe wiha vedibêje:


"Ferman e ferman e
Dayê li me ferman e
Heyf sed mixabin
Çavê reş û belek bi paçika girê dane
Ew dest û tîliyê qelemê kelepçe dane
Serokê mezin, şêrê Kurdan dane heps û zindan e
Vê carê ferman e me giran e
Dayê li me fermane
Bavo li me fermane"

Stranên hunermend Dilgeş êş, berxwedan û şehîdên gelê Kurd vedibêjin. Dilgeş di hevpeyvîneke me ya sala 2006'an de wiha gotibû:

"Min di salên 1980 û 1990'î de bi Zozan, Seyîdxan, Xelîl Xemgîn û Serdar re di gelek şevan de konser dan. Carekê li Munsterê 15 hezar kes tev lê bûn. Dema ku ez bi Hunerkom re xebitîm, rojên min ên herî xweş bûn. Ez bi siûd im ku min bi hunera xwe xizmet ji gelê xwe re kir. Min êş û kêfxweşiya wî anî ser ziman. Gelê me ji bo azadiya xwe tê dikoşe. Ez jî bûm parçeyekî eniya hunerê ya vê têkoşînê. Ez silavên xwe ji serok Apo, Cemîl Bayîk, berxwedêrên zindanê û gerîla re dişinim. Ew her tim di dilê min de ne."

# Efsaneya Newrozê ji bo zarokan

**Pirtûkeke zarokan ya li ser Newrozê bi awireke ji Kurdistanê, bi Ingilîzî derket. Peri-Khan Aqrawi-Whitcomb (Perîxan Aqrewî-Whitcomb) nivîskara pirtûkê ye.**




Pirtûkeke zarokan ya li ser Newrozê bi awireke ji Kurdistanê, bi Ingilîzî derket. Peri-Khan Aqrawi-Whitcomb (Perîxan Aqrewî-Whitcomb) nivîskara pirtûkê ye. Wê weşana kitêba xwe beriya Newrozê, di dema rast de bi kêfxweşî li ser medya dijîtal parve kir. Navê pirtûkê ev e: "Children of the Sun and Bearers of Light: How Kawa and his friends save the Spring Equinox, Newroz!" (Zarokên rojê û hilgirên rohniyê: Çawa Kawa û hevalên wî destpêka biharê Newroz xilas kir!).

Çîrok bi "Hebû nebû, kes ji Xwedê mezintir nebû" dest pê dike, lê wekî din bi Ingilîzî ye. Di destpêka kitêbê de çend malikên Melayê Cizîrî li ser Newrozê jî hatine nivîsandin. Ev du malik bi wergera ber bi Ingilîzî ve ya Alexie Sandrine hatine wergirtin, lê mixabin nivîskarê ji bîr kiriye navê wergêr hilde.

Perîxanê xwestiye versiyoneke li gorî zarokan a efsaneya Kawayê Hesinkar ji bo zarokên Kurd ên li derveyî Kurdistanê çêke.

Wê beriya niha jî Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi sernavê "Holy Dolma and Honey Pie - Of Friendships and Miracles" lihevanîbû ji bo zarokan.

Nivîskar li Elmanyayê hatiye dinê, lê ew dibêje, ew serhatîbêjî û çîrokbêjiya Kurdan dixwaze dewam bike. Axir heger we meraq kir, kitêba wê ya li ser Newrozê ji bo zarokan, li Amazonê tê firotin.

***Ozgûr Polîtîka***

# Richelieu bi torbeyên qûmê nixumandin

**Li Odessa ya Ukraynayê peykerê "Richelieu" yê navdar bi torbeyên tijî qûm, hat nixumandin.**

Li Odessa ya Ukraynayê peykerê "Richelieu" yê navdar bi torbeyên ku tijî qûm in, hate nixumandin. Ukraynayî bi vî awayî dixwazin peykerê dîrokî ji êrişên Rûsyayê biparêzin.

Peykerê bi navê "Richelieu" sala 1828'an li Odessayê hatiye çêkirin. Ev peykerê ku li meydana Primorsky ye, ji bo kesên diçin Odessayê weke cihekî tewafê bû. Heta gelek kes ji bo peyker diçûn Odessayê.


Richelieu bi navê tam "Armand Emmanuel du Plessis, dukê Richelieuyê" sala 1803´yan ji bo Împaretoriya Rûs, bûbû waliyê Odessayê.

Ew paşê ji bo Rûsyayê waliyê giştî yê Xersonê jî sala 1805´an. Di şerên li dijî Osmaniyan de jî di salên 1806 û 1807´an de ew ji fermandarên artêşê bû.

***Ozgûr Polîtîka***



## Durûtiya Ewropiyan û cîhanê li hemberî Kurdan



Sîpan Şînda

Piştî ku di 24'ê heyva sibatê de Rûsya êrîşî Ukrayna kir, kevirên siyasetê ji cihê xwe şehitîn û her kes lê digere ku kevirê siyaseta xwe ji nû ve lê bike. Lewre ev êriş ne weke rewşa li Iraq, Efxanistan yan ji li Sûriyê qewimî ye. Piştî şerê cîhanê yê duduyan (1939-1945) û heta niha ev cara ewil e şerekî evqas jidil dest pê dike. Dinya hemû ji vê biryarê şaqis ma û ket nava sehmeke mezin. Li tevayê cîhanê bi teybetî jî kesên demokrat û azadîxwaz li hemberî vê êrişê dengê xwe bilind kirin. Hema bêje hemû desthilatdariyên dinyayê Rûsya şermezar kirin û aligiriya xwe bi awayekî eşker ji Ukrayna re diyar kirin. Bêguman ev tiştekî pir baş bû. Li kû derê dibe bila bibe divê mirov li hemberî şer derkeve û azadiya gelan biparêze. Divê mirov piştgiriya mezlûman û azadîxwazan bike. Divê mirov bi awayekî eşkere û bi dengekî bilind li hemberî zalim û şerxwazan bisekine. Lê îca ka ew xîret û exlaq, ka ew merdemêrî û insanetî!

Bêguman dinya ne ji kula Ukrayna û çav û birûyên Zelenskî yên reş ketiye. Bi teybetî jî Ewropa. Lê belê ewan eva henê ji xwe re tehlûke dîtin û ji ber wê dengê xwe derxistin û li hemberî Rûsya sekinîn. Ewropî dizanin ku heke Ukrayna bikeve destê Rûsya wê deriyê Ewropa bi awayekî rihetî ji Rûsya re vebe û wê ti caran xwe, azadiya xwe û serxwebûna welatê xwe di ewlehiyê de nebînin. Ew dizanin heke Rûsya li Ukrayna bibe desthilatdar, wê çovê wê her tim li ser serê Ewropiyan be û wê Ewropa êdî çi xweşiyê ji xwe nebîne. Ango azadiya wan, keyf û xweşiya wan êdî dikeve ehtûbehtê. Ji ber wê hema rabûn ser hilûpepana û alîkariya aborî û leşkerî ji Ukrayna re rêkirin û hê ji rêdikin. Ne tenê desthilatdariyên welatan, herweha saziyên serbixwe jî meblaxên mezin alîkariyê didine Ukrayna. Li hemû welatan her hefte çalakî li hemberî Rûsya tên kirin û ambargoya aborî, lojîstîkî û leşkerî her roj li ser Rûsya stûrtir dibe. Ya rast ti kes bi xwe re nabîne bikeve şerî li hemberî Rûsya, hema dixwazin bi ambargoyan Rûsya qels bikin.

Ev tişt ji sedî sed rast e û divê di vî warî de çi tawîz jî neyên dayîn. Lê belê gilî û gazinda me ji dinyayê û bi teybetî jî ji Ewropiyan li ser durûtiya wan ya li hemberî Kurdan e. Bi piştgirî û biryara wan di 1923'yan de welatê Kurdan bû çar perçe û ji wê rojê hetanî niha Kurdan xweşî ji xwe nedîtiye û her tim di nava şer de ne. Bi milyonan Kurd bi destê çar dewletên hov hatine kuştin. Gazên kîmyayî li hemberî Kurdan hatine bikaranîn û bi hezaran termên Kurdan ketine kolanan. Lê mixabin çi dengek ji dinyayê derneketiye. Dev jê berde dengê xwe derxin, ev e sed sal in Kurd bi çekên wan têne kuştin. Kurd têkoşîna azadiya xwe û welatê xwe didin, Ewropî jî çekên xwe difiroşin neyarên Kurdan û bi wan çekan jî Kurdan dikujin. Alîkariya aborî, lojîstîkî û leşkerî li aliyekî, Ewropiyan û dinyayê rêxistinên ji bo mafê gelê Kurd têdikoşin jî wek "terorîst" îlan kirine û kuştina Kurdan ji bi vî awayî rewa kirine. Lê her tim jî dibêjin em demokrat in û azadîxwaz in. Rast e, ji bo gelê xwe welê ne. Lê belê dema dabaş dibe Kurd, her kes kerr e, kor e, lal e.

# Şaredariya Gel ya Qamişlo hewl dide sala 2022`yan xizmetgûzariyê pêş bixe

Hevseroka Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo Cîhan Yûsiv got, emê 1`ê Nîsanê dest bi projeyên xwe yên sala 2022`yan bikin, herwiha emê projeyên sala çûyî yên neqediyayîn jî biqedînin.

**Darîn Silê-Qamişlo**

Ji bo xizmeta gel, di destpêka şoreşa Rojava de, li Qamişlo şaredarî hat avakirin. Tevî êrîşên dewleta Tirkan û dagîrkeriya li herêmê, ji destpêkê heta roja îro şaredarî bênavber û bi rêxistinî xebata xwe didomîne.
Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo li gorî imkan û pisporiya ku xwe projeyan amade dike. Herwiha hewl dide xizmetgûzariyê li nava bajar û taxên girêdayî wê de pêş bixe û xebata xwe berfirehtir bike, da xizmetgûzarî ji ya salên berê baştir bibe.
Têkîldarî mijarê Cîhan Yûsiv da zanîn ku sala borî gelek proje pêk anîne û axaftina xwe wiha domand: "Sala borî me li ser gelek projeyan kar kir. Hin ji wan qediyan lê hin neqediyane. Emê îsal wan jî biqedînin. Projeyên me li ser kar kirî, weke projeya serf Sihî, sererastkirina kolanên nava bajêr, qîrkirina riyên sereke û sebixkirina munesîfata, peqijî û projeya çadiniya daran."
Li ser kar û xebata şaredariyê û planên ji bo sala nû, Cîhan ev agahî dan: "Ji bo pêkanîna proje û planên sala 2022`yan yên hatîn amadekirin, şaredariya me bi alîkariya licneya şaredariya kantonê, wê heyva Nîsanê dest bi kar bike. Ji ber derengmayîna mîzana şaredariyê kar û xebata me jî dereng ket. Ji bo wê emê di demeke nêz de dest bi projeyan bikin. Da ku em di dawiya salê de tevayiya kar û xebata xwe temam bikin."

**`Emê giringiyê bidin sererastkirina riyên sereke`**

Cîhan teqez kir ku wê îsal giringiyê bidin projeya ziftê û wiha pê da çû: "Ji ber ku gelek riyên bajar yên sereke pir xirab in, emê hewl bidin ku îsal wan pirsgirêkan bi temamî çareser bikin. Çimkî çûnhatina nava bajar jî zêde ye. Herwiha emê îsal ji bo projeya baqijî, avakirina çarxerêyên nû û ronîkirina kolanên nava bajêr jî bixebitin"
Cîhan got, gelek avayiyên nû li nava bajêr hatine çêkirin û ji herêmên cuda gelek kes koçberî nava bajêr bûne. Ev jî tê wateya pirbûna mirovan. Her çiqas me kar kiribe û proje pêk anîbin jî, lê ji bo xizmeta gel kêm e. Çimkî jimara gelê bajêr zêde ye û gelek karên cuda ji me tên xwestin.

**Tevî êrişên ser herêmê karê şaredariyê berdewam e**

Cîhan Yûsiv bal kişand ser bandora êrişên ser herêmê û got, çawa ku tê zanîn êrîşên dewleta Tirkan û dagîrkeriya li herêmê, heta niha jî dewam dikin. Ji ber wê me gelek astengî didîtin û hin projeyên me nîvco man. Digel wan astengî û zehmetiyan jî karê me nehat rawestandin.

**`Divê gel alîkar be`**

Hevseroka Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo Cîhan Yûsiv di dawiyê de bang li gel kir ku bi wan re bibin alîkar û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tişta ku bandorê li kar û xebata me dike desteknedana gel e. Gelek caran gel bi me re ne alêkar e. Kar û xebata me tev ji bo gel e. Ji bo wê jî dema em darekê diçînin yan xebatekê dikin divê gel piştgiriya vê xebatê bike. Bi taybetî di milê paqijiyê de, divê her kes baldar be, da em bi hev re bajarekî paqij ava bikin."



# Li Şedadê baxçeyê giştî hat vekirin

**Piştî kar û xebata 3 mehan, Şaredariya Gel ya Şedadê ya kantona Hesekê sererastkirina baxçeyê giştî bi dawî kir.**

Bi armanca geşkirina navçeyê, Şaredariya Gel a Şedadê li taxa başûr baxçeyê giştî bi rûbera 5 doniman sererast kir û li baxçe bîrek kola.
Endamê rêveber ê Beşa Jîngehê ya şaredariyê Ehmed Siûd diyar kir ku kar û xebata sererastkirina baxçeyê giştî 3 mehan dewam kir û îro baxçe hate vekirin.
Ehmed Siûd anî ziman ku sererastkirin bi hevkariya Rêxistina Rizgarkirina Zarokên Cîhanê hate kirin û li Şedadê ev baxçeyê yekemîn e.
Siûd destnîşan kir ku zêdetirî 250 dar li baxçe hatine çandin, kursî û stûnên ronîkirinê jî lê danîne. Ehmed Siûd bang li gelê navçeyê kir ku parastina avahiyên giştî bikin.
Şaredariyê xebatkarên bi roj bixebitin û nobedarek ji bo ku bi şev nobetê lê bigire, diyar kirin.
*ANHA*



# Barana dawî hêvî da cotkaran

**Barana vê dawiyê bariyayî hêvî da cotkaran. Pisporekî çandiniyê da zanîn ku rêjeya baranê negihîşt asta tê xwestin, lê mewsim di rewşeke baş .de ye**

Piştî demeke dirêj ji qutbûnê û kêmbûna barana payîzî, ji çarşema borî ve li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê baran dibare.
Tê zanîn ku par ji ber hişkesaliyê, çandiniyê bejî telef bû û cotkar û xwendi-.yên sewalan ziyanên mezin dîtin





Pisporê çandiniyê Serbaz Hawil diyar ku mewsimê çandiniyê heta niha di rewşeke baş de ye, ji ber ku rêjeya barana rojên dawî .hêvî da cotkaran
Li gorî pisporên çandiniyê, rêjeya barîna baranê ya pêwîst û guncaw ji bo mewsimekî çandinî ya serkeftî li herêmê 440 mm e. Lê .heta niha 160 mm bariyaye
Serbaz Hawil destnîşan kir ku rêjeya heyî baş e û wiha domand: "Ev rêje guncaw e ku mewsimekî baş derkeve. Ya ku dihêle mewsim serkeftî encam bide baran û berfa ku di navîna kanûna borî de bariye di demeke guncaw de bû bi taybet ji bo genim û ".hişt ku nexweşiyên çandiniyê tune bibin
Hawil da zanîn ku barana mehên Sibat û .Adar ji bo genim û ceh gelekî baş bû
Di dawiyê de Serbaz Hawil bang li cotkaran kir ku dermanên mêşûmûran bireşînin û gihayên bi ziyan rakin. Her wiha got, pêwîstî bi çavdêrîkirina deverên çandiniyê heye ku kêzik û kurmên ku zirarê didin çandiniyê .werin parastin
*ANHA*

# Komîteyên lihevanînê du eşîr li hev anîn

**Komîteyên lihevanînê û rûspiyên eşîrên Kurd û Ereb yên Hesekê nakokiya di navbera eşîrên Bobilan û Gabaran de çareser kir.**


Şêx û rûspiyên eşîran, komîteyên lihevanên, bi amadebûna endamên saziyên Rêveberiya Xweser, Meclisa Aştiya Navxweyî û kesayetên civakî, merasîmê lihevanîna eşîrên Bobilan û Gabaran de li dar xist. Nakokiya her du eşîran 5 salan dewam kir, sedema wî vedigere sala 2017'an ku ji eşîra Bobilan Salar Idrîs Hesen di encama qezaya trafîkê de ku ji aliyê eşîra Gabaran .ve hatibû kirin, jiyana xwe ji dest da
Konê merasîmê lihevanînê ji aliyê eşîra Gabara ve li taxa Salihiyê ya Hesekê hate .vedan û firavîn hat amadekirin
Şêwirmenda Meclisa Kantona Hesekê Zeyneb Şîtka axivî û lihevhatina herdu eşîran pîroz kir û got: "Ji me hemûyan Kurd, Ereb û pêkhateyên din tê xwestin ku li gorî rêgezên neteweya demokratîk û biratiya gelan bi hev ".re bijîn, ji hev hez bikin û hevdu efû bikin
Ji qebîleya Cibûr, Şêx Hesen El-Mislit anî ziman ku ev kon ji bo çareserkirina pirsgirêkan hatiye vedan û got: "Ev nîşaneya resnebûn û ".biratiya gelan e li herêma Cizîrê ye
Di merasîmê de, serokê Komîteya Lihevanînê ya Hesekê Rêşad Xanim spasiy meclisên rûspiya, komîteyên lihevanînê û kesên ku di vê lihevanînê de beşdar bûne kir û banga aştî, hezarkirin û diyalogan li .pêkhateyên herêmê kir
Di dawiyê de eşîra Gabaran xwarin li danî ber beşdaran û her du aliyên bi nakok bi .hembêzkirin li hev hatin
*ANHA*



# Rêveberiya Çandiniyê ya Girê Spî destekê dide cotkaran

**Meclisa kantona Girê Spî ji ber ziwabûna li herêmê, piştgiriyê dide qada çandiniyê. Rêveberiya Çandiniyê sedemên paşketina alîkariyê anî ziman.**

Rêveberiya Çandiniyê ya Girê Spî bi koordîneya Şirketa Pêşxistina Civaka Çandiniyê ji bo ku mewsima çandiniyê ya zivistanê yên genim û ceh bi ser bikeve, di warê sotemenî û semadê de piştgiriyê dide cotkaran.
Li navçeya Girê Spî û gundewarê navçeya Eyn Îsa çandinî bi ava baranê ve girêdayî ye. Di salên dawî de hejmareke zêde ya cotkaran bîrên artezan kolandine. Sedema vê yekê kêmbûna baranê di salên borî de. Her wiha beşek ji cotkarên nêzî çemê Belîx bi rêya jenartoran zeviyan av didin.
Ji destpêka mewsima zivistanê ve, Gerînendeya Çandiniyê, sotemenî li hemû cotkarên ku xwediyê ruxseta çandiniyê wergirtine, belav kir. Ev yek piştî lêkolînkirina zeviyên wan ên çandiniyê û jenartorên avdanê, çi ji bîr dibe çi jî li ser çemê Celab (Belîx) be pêk hat. Heta niha 5 milyon û 600 hezar lître mazot li cotkaran hatiye belavkirin û belavkirin berdewam e.
Gerînendeya Çandiniyê ya navçeya Girê Spî di belavkirina mazotê li cotkaran de xwe dispêre sîstemeke taybet ku li ser 4 beşan tê belavkirin. Du beş hatin belavkirin û dê beşa sêyemîn jî were belavkirin.
Têkildarî semadê jî tenê carekê bi qasî hezar 200 ton hatiye belavkirin û belavkirin rawestiya ye.
Der barê pêwîstiya cotkaran bi semadê û sedema rawestandina belavkirina wê de, hevserokê Gerînendeya Çandiniyê ya navçeya Girê Spî Ebdullah El-Xelîl diyar kir ku pêwîstiya wan semadê li gorî beşa yekemîn bi qasî 1200 ton e û sedema derengxistina belavkirina beşa duyemîn ji ber dorpêçkirina herêmê ye.
Ehmed El-Hemûd yek ji cotkarên navçeya Eyn Îsa ji gundê El-Xeswan got sotemenî li wan hate belavkirin û ew miqdara ku wergirtine ji bo wan bes e.
El-Hemûd li ser derengmayîna belavkirina sotemeniyê gilî kir û got: "Ji bo avdana zeviyên çandiniyê demên wê yên taybet hene û nabe were derengxistin, ger em neçar bimînin em ê sotemeniyê ji bazara reş bikirin."
Li ser sedema derengxistina belavkirina sotemeniyê, hevserokê Gerînendeya Çandiniyê Ebdullah El-Xelîl got: "Eewşa leşkerî ya kantona Girê Spî û navçeya Eyn Îsa gihandina destekê ji bo hin gundewarên kantonê asteng dike, ji ber ku piraniya gundan nêzî eniyên şer in ku êrişên dewleta Tirk li ser wan berdewam in, ev jî xebata belavkirin sotemeniyê asteng dike.
Rûbera zeviyên çandiniyê li kantona Girê Spî yên ku ji aliyê gerînendeyê ve hatin ruxsetkirin, 26 hezar hektar e, jê 13 hezar hektar bi genim û 13 hezar hektar jî bi ceh hatiye çandin. Her wiha rûbera giştî ya zeviyên çandiniyê 29 hezar hektar e bi qasî 3 hezar hektar zeviyên bi ruxset zêdetir e û hejmara zeviyê çandiniyê yên bi ruxset hezar û 316 ruxset e.
*ANHA*





# Gelên Şingalê li dijî danîna sînoran meşiyan

Li hemberî biryara hikûmeta Iraqê ya çêkirina sînoran di navbera civakên Êzîdî û Ereb yên li Şingalê de welatiyên Ereb û Êzîdî bi meşeke girseyî biryar şermezar kirin û diyar kirin ku wê kiryareke wiha qebûl nekin.

Li dijî hewildana hikumeta Kazimî ya avakirina sînorên di navbera civaka Êzidî û Ereban de îro di demjimêrên piştî nivro de li Gundê Xelef yê girêdayî Navçeya Sinûnê meşek hate li darxistin.
Di meşê de ji pêkhateyên Ereb û Êzidiyan gelek kesan cihê xwe girtin. Meşvanan bê navber dirûşmeyên "Şengal Azad e" "Yê xayin derkeve derve" û "Bijî yekîtiya gelan" berz kirin. Her wiha pankartên "Em têlkirina derdora gundên xwe qebûl nakin, em weke siyaseteke tunekirina yekîtiya gelan dibînin" hatin vekirin. Di dawiyê de gel li pêşiya nuqteya leşkerên Iraqê daxuyaniyek dan. Daxuyanî ji aliyê Hevserokê Meclisa gundê Hesewîkê Xidir Salih ve hate dayîn.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:
"Em weke eşîr û serok eşîrên Ereb û Êzidî li şengalê, kiryarên hin aliyên hikumeta Iraqê bi danîna têl di navbera gundên Ereb û Êzdiyan ya li şegnalê şermezar dikin. Em vê kiryarê jî weke binpêkirina yasayên civakî û eşîretê ya herêmê dibînin. Em hemû dizanin ku li ser vê erdnîgariyê gelekî şer qewimîn. Hemû jî dixwestin navbeyna me Êzidî û Ereban perçebûnê çêbikin. Di heman demê de her kes dixweze di navbera hemû netew, bawerî û pêkahteyên ku di Iraqê de jiyan dikin perçebûn û cudabûnê çêbikin. Lê heya roja îro nekarîn van planan bi cih bînin. Berevajî di navbera me hemûyan de biratiyekî xurt ava bûye. Lewma em weke netewa Ereb li herêmê têlkirina derdora gundên me li dijî berjewndiya herêmê dibînin. Wê van têlane jiyana aram a di navbera pêkhateyên herêmê de bihejîne. Di heman demê de wê di aliya aborî de jî valatiyekê ava bike.
Em bang dikin ku biryara têlkirina gundên me bê sekinandin. Ji ber ku ev biryar wê tenê li dijî berjewendiya Iraqê û herêmê be. Em bang li hikumeta Iraqê dikin ku carekî din di mijara têlkirina gundan de bihizire û bi biryarekî ku ne aliyên siyasî yên Iraqê razî bike, belku hemû pêkahateyên herêmê pê razî bin peşkeş bike. Em naxwazin ku herêma me bibe qurbaniyê siyasta dijminane ku li Iraqê tê meşandin."
Daxuyanî bi berzkirina dirûşmeyên "Bijî yakîtiya gelan" û "Bijî Iraqekî azad û demokratîk" bi dawî bû.
*ROJNEWS- ŞINGAL*



# Îranê êrişî Hewlêrê kir

**Wezareta Navxweyî ya Herêma Kurdistanê, li ser êrişa ser Hewlêrê, daxuyaniyek da û got, di encama êrişa ser Hewlêrê de, welatiyek tenê bi sivikî birîndar bûye."**

Wezareta Navxweyî ya Herêma Kurdistanê, li ser êrişa li dijî Hewlêrê, daxuyaniyek da û got, di encama êrişa li dijî Hewlêrê de, tenê welatiyek bi sivikî birîndar bûye.
Êrişa bi 12 fuzeyan 12'ê mehê nîvê şevê (saet 01:06'an) pêk hat. Li gor çavdêran, armanca êrişa bi fuzeyan konsolosxaneya Emerîkayê ya li Hewlêrê û derdora wê bû. Wezareta navxweyî ya hikûmeta Hewlêrê da zanîn ku welatiyek bi sivikî birîndar bûye.

**Supaya Pasdaran kiriye**

Li aliyê din doh di Supaya Pasdaran a Îranê bi fermî berpirsyartiya êrişa bi mûşekan a ser Hewlêrê li xwe girt û got: "Baregeheke stratejîk a îstixbareta Îsraîlê (Mosad) hedef hatiye girtin."
Pasdaran got, "Di bersiva du sûcên vê dawiyê yên rejîma sexte ya siyonîst de ya ku berê me ragihandibû wê bê bersiv nemîne, şeva bihurî navendeke stratejîk a sûcên siyonîst bi mûşekên bihêz ên hêzên Supaya Pasdaran ên Înqîlabî yên Îslamî hedef hatin girtin."
Supaya Pasdaran fort dan xwe li dijî Îsraîlê û got, "Careke din em rejîma tewankar a siyonîst hişyar dikin ku dubarekirina her tewanekê wê rastî bersiva herî tund û wêrankar bibe. Em dubare dikin ku aramiya welatên Îslamî xeta sor a hêzên çekdar a Komara Îslamî ya Îranê ye. Em rê nadin ti kes gef û metirsiyê li ser çêke."
Li gorî medyaya Îranê di êrişê de 9 berpirsên Îsraîlî mirine yan ji birîndar bûne. Ajansa Fermî ya Îranê Mehrnewsê, navê 9 fermandar û berpirsên Îsraîlê hilda û ku di êrişa li dijî Hewlêrê de hatine kuştin yan ji birîndar bûne.
*Yenî Ozgur Politika*




# Ji ber greva bijîjkan nexweşxane vala man

**Navenda Nûçeyan**

**Ji ber ku TTB`ê ji bo daxwaziyên xebatkarên tenduristiyê dest bi grevê kir nexweşxane vala man.**

Li gorî agahiyên ajansa Mezepotamya greva ku Yekitiya Bijîjkên Tirk (TTB), ji bo pirsgirêk û daxwazên xebatkarên tenduristiyê bi navê "Greva Mezin" plan kiribû, 14'ê mehê dest pê kir.
Ji ber ku xebatkarên tenduristiyê ketin grevê, li bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê nexweşxane vala man. Hima bêje ji sedî 100 ji bijîjkan tevlî grevê bûn. Li nexweşxaneyan tenê beşên lezgîn dixebitin.
Hêjayî bîraninê ye ku beriya demêkê li hember helwest û nerazîbûna şert û mercên ku bijîjk tê de dixebitin, serokvezîrê tirkî Erdogan got, 'pêvîstiya me bi wan bijijka nine, kî bixwaze bila biçe; mineta me bi wan nine'. Herwiha pişti kirîza pirali ya Tirkyê û şerdûmercên xirab yên kar, pir bijîjkên profesyonel ji walatê xwe derketin û çûn walatên derve.



# KCDK-E: Em sala 50'î bikin Newroza azadiya Rêber Ocalan

**Navenda Nûçeyan**

**KCDK-E bernameya çalakiyên Newrozê yên li gelek welatên Ewropa eşkere kir û ev bang kir: "Bi ruhê yekîtiya neteweyî em Newroza 50. bikin Newroza azadiya**



**Rêber Ocalan û Kurdistanê.**
Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) ragihand ku wê li 15 welatan li gelek bajaran bi dirûşma "Rêberê Azad" Newrozê pîroz bikin.
Di daxuyaniya KCDK-E'yê de hate ragihandin, Newroz a ku cejna azadî û berxwedanê ya gelên Kurdistanê û Rojhilata Navîn e, îsal wê li her derê bi dirûşma "Rêberê Azad" bê pîrozkirin.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku Newroza li cografya Kurdistanê û Rojhilata Navîn bi hezaran sal in weke destpêka biharê tê pîrozkirin, ji bo gelên Kurdistanî di heman demê de navê berxwedan û vejînê ye.
KCDK-E'yê destnîşan kir ku Newroza 2022'an wê ji bo gelan bibe hêviyên mezin û wiha dewam kir: "Ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û azadiya bi hezaran girtiyên siyasî, wê bibe Newrozek



ku têkoşîn hîn bêhtir bê xurtkirin."
Di daxuyaniyê de nevroz hat pîrozkirin û ev peyame jî hat dayîn: "Gelê me wê bi vê Newrozê re yekîtiya neteweyî xurtir bike, bi kincên xwe yên neteweyî ji bo destketiyên civakî û neteweyî biparêze, li dijî dagirkerî û mêtingeriyê wê li her welatî li qadan Newrozê pîroz bike. Bi navê KCDK-E'yê Newrozê di destpêkê de li Rêberê Gelê Kurd Rêber Apo, gelên berxwedêr û gelên Rojhilata Navîn pîroz dikin."

# Li gorî rapora SIPRI dinya bi çek dibe

**Li gorî rapora ku SIPRI eşkere kirî, gelek welatan xerckirinên xwe ya ji bo çekan zêde kiriye. Li Ewropa, firotina çekan berî şerê Ukraynayê dest bi zêde-.bûnê kiriye**

Enstîtuya Lêkolînên Aştiyê yên Navneteweyî ya Stockholmê (SIPRI), derbarê bikaranîn û zêdebûna çekan de raporek weşand. Li gorî raporê di navbera salên 2017-2021'an de li ber salên di navbera 2012-2016'an de bazirganiya çekan li seranserê dinyayê ji sedî 4,6 kêm bûye, lê li welatên Ewropayê xerckirina çekan ji sedî .19 zêde bûye

Di raporê de nêrînên pisporên ku ji bo raporê lêkolînan kirine jî hatine parvekirin. Pispor, zêdebûna firotina çekan a li Ewropayê bi hewldanên Rûsyayê yên li dijî Kirim û Don-.bassê ve girê didin
*MA*



# `DERMANÊ BIRÎNÊN HELEBCEYAN YEKÎTIYA NETEWEYÎ YE`

**Jinên Kurd gotin, ji bo Helebceyên nû çênebin, divê Kurd têkoşîna xwe xurttir bikin û bi hev re li destkeftiyan xwedî derkevin. Herwiha dan zanîn ku êrîşên niha yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê, berdewama komkujiya Helebca ne.**

**Darîn Silê-Qamişlo**

**16`ê Adarê ji asîmanê Helebce jehir dibarî**

Bajarê Helebce ku 80 hezar kes lê dijiyan, derdora saet 11:30`an, 50 balafirên şer yên Iraqê bi ser bajar ketin. Heta 5 saetan bombe û gazên jehrê bi ser de barandin. Mirovan nikaribû nefesê bistînin. Piştî bombebaranê, bajarê Helebce ket xeweke giran ku ti deng nedihatin bihîstin û ti tevger nedihatin dîtin. Herwiha şopên jiyanê winda bûbûn. Tenê di çend saetan de, zêdetirî 5 hezar sivîlî ku di nav de zarok, jin û kesên temenmezin hebûn, jiyana xwe ji dest dan û nêzî 10 hezar kesî jî birîndar bûn. Êrîşa bi kîmyayê ya hêzên Iraqê li dijî bajarê Helebce wek komkujiyeke herî xerab û li dijî mirovayiyê hat hesibandin.

Bi pêmana salvegera 34`an ya komkujiya Helebce Endama koordînasiyona Kongreya Star ya herêma Efrînê Şîrîn Hesen û Cîgira Desteya Diravî ya herêma Cizîrê Nadiya Yûsiv ji me axivîn.



**'Hebûna Kurdan tinekirina siyaset û berjewendiyên dagîrkeran e'**

Şîrîn Hesen tevayiya şehîdên komkujiya Helebce û şehîdên azadiyê bîr anîn û wiha got: "Ji dîrokê heta niha gelê Kurd rastî gelek komkujî û qirkirinên komî yên bi destê sîstemên zordest hatiye. Komkujiya Helebce jî yek ji wan e. Ev komkujî ne li ser gelê Helebce tenê, li ser tevayiya gelê Kurd hat kirin û ev komkujî berdewam in: Mîna Kobanê, Efrîn, Til Rifat, Serê Kaniyê, Girê Spî û Şingalê. Her kes ji xwe re rawa dibîne ku komkujiyan bi serê Kurdan de bîne. Çimkî hebûna Kurdan tinekirina siyaset berjewendiyên dagîrkeran e."

**'Dagîrkirina Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî bi heman armanc û siyasetê bû'**

Şîrîn da zanîn ku êrîşên niha ser bakur û rojhilatê Sûriyê, ji aliyê dewleta Tirkan ve tê kirin, berdewama vê komkujiyê ye û axaftina xwe wiha domand: "Bi hevkariya dewletên serdest êriş û komkujiyî li ser gelê Kurd tên kirin. Çimkî hedefa wan ew e ku Kurdan ji çand, dîrok û ji rastiya wan dûr bixin. Heta niha êriş û komkujiyan li ser Kurdan didomînin. Heta niha jî tevayiya dewletên serdest li ser Kurdan dibin yek. Bi taybetî li Rojava bi avakirina şoreşê re, rojane êriş li ser gelê Kurd tên kirin. Ev êriş tev berdewama Helebce ne. Xwestin di komkujiya Efrînê de dîroka Helebce bînin ber çavên me. Dagîrkirina Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî û Şingelê bi heman armanc û siyasetê bû."

**'Ne Helebce tenê gelek birînên me hene'**

Cîgira Desteya Diravî ya herêma Cizîrê Nadiya Yûsiv jî li ser komkujiyê ev nirxandin kir: "Komkujiya Helebce birînek ji birînên gelê Kurd yên biêş û bijan e. Ji ber ku Kurd xwediyê welatekî zengîn û pîroz in, ev komkujî bi serê wan de tên. Her kes dixwaze li ser vê xakê berjewendiyên xwe pêk bîne. Ji ber wê li hemberî van sûcan bêdeng dimînin. Ne Helebce tenê gelek birînên me hene. Ji Birînên me yên herî giran komkujiya Geliyê Zîlan, Dêrsim, Şingal, Efrîn û Serê Kaniyê ne. Divê em dîroka xwe baş nas bikin, da bikarin planên



dijmin têk bibin."

**'Di salvegera komkujiya 34'an de metirsia komkujiyên mezintir heye'**

Nadiya axaftina xwe wiha domand: "Di salvegera 34`an ya komkujiya Helebce de, divê em bizanin ku metirsiya komkujiya Kurdan di rojevê de ye. Ji bo Helebceyên nû çênebin, divê hêzên siyasî û partiyên kurdî bibin yek û bi hev re li Kurdistanê xwedî derkevin."

Nadiya Yûsiv êrîşên dewleta tirkî ya dagîrker yên bi çekên kîmyayî bîr anîn û ev li axaftina xwe zêde kir: "Dewleta tirkî çekên kîmyayî yên ku di qada navneteweyî de qedexe ne, li ber çavê civaka navneteweyî bi kar tîne. Ev weke komplo û hevkariya dewletên serdest bi dewleta tirkî ya dagîrker re nîşa dide. Dewletên serdest û rêxistinên mafên mi-



rovan li hemberî kiryarên dewleta Tirkan yên li rojavayê Kurdistanê kor û lal bûne, lewra berjewendiyên hevpar di navbera wan de hene."

**`Yekîtiya me dermanê hebûna me ye`**

Nadiya got, dema dijmin êrişî me dike gelo em Kurd nikarin bibin yek û dagîrkeran têk bibin? Ji bo pêşîgirtina li van komkujiyan pêwîst e gelê me li yekîtiya xwe bigere. Eger yekîtiya me hebûya komkujî nedihatin serê me Kurdan. Çimkî yekîtiya me dermanê hebûna me ye. Banga min ji gelê me re ew e ku li yekîtî û zimanê xwe xwedî derkevin, da ku em hêza xwe xurttir bikin û êrişên û komkujiyên heyî bidin sekinandin.

Cîgira Desteya Diravî ya herêma Cizîrê Nadiya Yûsiv di dawiyê de diyar kir ku tişta herî biêş bêdengiya navneteweyî ye û axaftina xwe wiha qedand: "Her tim tiştên ku bi serê Kurdan de tên kirin bi hêsanî derbas dibin û ti kes berçav nagire. Di her êrişa ku li ser Kurdan tê kirin de dewletên serdest meyze êşa me dikin û dengê xwe nakin. Lê wek gelê Kurd em ti caran li hêviya dengê ti kesî nemane, em miletekî berxwedêr in û ji armanca xwe venagerin."



Li Ukrayna mijara şervanên bi pere

**Ahmet Aktaş**

Piştî Sûriyê, Libya, Qerebaxê û hinek welatên din, mijara leşkerên bi pereyan (lejyon) ket .rojeva şerê Ukrayna

Rojên agahiyên gumana ku wê şer li vî welatî dest pê bike ket çapemeniyê, di heman rojan de li ser heman mijarê, nûçeyên amadekariyên dewleta Tirkan ên ji bo çekdarên bi pere jî di .çepemeniyê de xuya bûn

Weke tê zanîn di vî warî de dosyaya dewleta Tirkan ne paqij e. Çekdarên ku bi pere kirê kirine û bi rêya SADAT'ê perwerde kirine, .şandine van dewletên mijara gotinê

Lê vê dema dawî hinek şer hatibûn rawestandin û ev saziya çekdaran perwerde dike; SADAT'a AKP-MHP'ê bêkar mabû. Dema ku bûhna şer li Ukraynayê hilanî, weke nêçîrvanê li bende .nêçîrê be, hema bi lez ket nava tevgêrê

Li gorî agahiyên Navenda Lêkolînên Statejîk A Kurdistanê, berpirsiyarên wan komên xwe yên ava kirine ji bo talan, wêran û kuştinê li Bakur û Rojhilatî Sûriyeyê bi cî kiribûn, li baregeha .leşkerî ya bajarê Kilîsê civandin

Ji Ebû Beşîr Errawîyê berpirsiyarê HTŞ (El Nusra), Ehmed Nur M.Ezîzî, Fehîm İsa û Ebû Emşa, ew 150 komên ku xwestibûn, kişandin .Kilîsê

Li gorî nûçeyê, ji bo her kujer HTŞ, DAIŞ û hwd. îslamîstên radikal 1.600 heta 3.500 dolar pere dane û ji bo şandina Ukraynayê amade .kirine

Xalek balkêş jî ew e ku, her du alî jî, aşkere ji welatên derve şervanan dixwazin. Lê ji bo ku şerma xwe veşêrin dibêjin "**kesên dilxwaz**" .bila werin

Hema piştî banga her du serokan; **Putin** û **Zelenskî jî,** daxwuyanî dan û gotin "***va ye ji dehan welatan bi hezaran kesên dilxwaz .hatine alîkariya me***" û hwd

Xaleke din a balkêş jê ew e ku her du alî jî, jimara nêzî hev didin û dibêjin "**15-16 hezar kes hatin**"! Bêgûman di gotina wan de cudahi- .yek jî heye

**Zelenskî** dibêje yên hatine û dixwazin werin alîkariya me, ji **52 welatan** e û piranî ji **Ewrupa** ne. **Putîn** dibêje yên hatine alîkariya me ji .**Rojhilata Navî n**e

Divê were zanîn ku saziya perwerdeya çekdarên bi pereyan **WAGNER**'a Putin jî heye û mirov dikare bêje, hema li hemû welatan ev saziya Putin û **SADAT**'a R.Erdogan hatine .dijberî hevdu

Wisa diyar e, li Ukraynayê hatina wan a himberî hevdu, dibe ku ji yên berê gelek dijwartir be jî. Jiber ku di vî şerî de, her çendîn xwe bêalî û qasidê aşbûnê dide xuyakirin jî, lê na xêr, di gelek axaftinên xwe de aşkere aligiri- !ya Zelenskî dike û şerxwaze

Helbet Putin vê hilwest û durûtiya wî, ji herkesan bêhtir nas dike û vêna jî li rexekê dinivîsîne, roja ku jê re lazim bû û şepa wî lê **!"**xweş bû, bêgûman ew ê bêje "**şah û mat**

Di encamê de, ev şerê Ukraynayê, êdî ji her alî ve zelaltir tê diyarkirin ku bi bingehîn şerê navbêna ***Rûsya û Emerîka*** ye. Lê ti dewlet û hêz nikarin bêje "**çi ji me re**"! Helbet asta .têkildarî û tevlêbûna her hêz û dewletê cuda ye

Bêgûman dîtin û helwesta Tevgera Azadiya gelê Kurdistanê jî li beramberî vê bûyera cîhanî (ku qonexeke giring a cenga 3'yan a cenga .cîhanî ye) heye û divê hebe

Di vê qonaxa nuh de, li ser dizayna nuh a cîhanî, ji jêr ta jor her dewlet û hêz, ji berê bêhtir û leztir hewcedarên hev in. Êdî Tevgêra Azadiya Kurdistanê jî, hetmen li gorî vê atmosfera nuh tev digere û di dizayna nuh de rêza .wxwe rastir bi cih dike

# 'Ocalan di tecrîdê de jî bihêz e'

**Şaredarê Filattierayê yê berê, Paolo Zammori got, 'Hêza Ocalan ew e ku fikra Konfederalîzma Demokratîk bi hûrgilî terîf kir û pêk anî. Tevî ku di hepsê de bû xebatên nû kirin, kitêbên nû nivîsandin. Min jî ev fikir li cem xwe hem yekser bi çûna Kurdistanê û hem jî bi xwendina weşanên elaqedar kokdar kirin'**

Şaredariya Filattiera ya Îtalî "welatîbûna rûmetê" dabû Rêber Abdullah Ocalan. Şaredarê Filattierayê yê berê, Paolo Zammori yê 78 salî, li dijî tecrîdkirina Ocalan bi awayekî çalak têdikoşe.

Zammori pirsgirêka Kurd bi Dino Frisullo nas kiriye, ji wî re jî dibêje, "birayê min Dino". Sala 1997´an wan bi hev re komeleya Kurdistan Azad damezrandibû. Gava ku şaredariya Filattierayê welatîbûna rûmetê 23´yê Nîsana 1999´an da Ocalan, Paolo Zammori şaredar bû. Zammori qederê 25 salan şaredarî kir (1975-99). Wî bi rojnamevan û dostê Kurdan Dino Frisullo ji bo Kurdistanê kar kir. Zammori gava ku Ocalan ji ber komployê çû Îtalyayê, çû bû serdana Ocalan. Ew gelek caran bi heyetan çû Kurdistanê jî û sala 1997´an di Trêna Aştiyê ya Mûsa Anter de jî cih girt. Di navbera 1998 û 2018´an de dewleta Tirk ew du caran ew dersînor kir. Ew di nava "Partiya Komunîst a



Avabûna ji nû ve" de cihê xwe digire û ev 30 sal in bi awayekî çalak li cem miletê Kurd têdikoşe.

Zammori bi rêya rojnamevanê Îtalî Dino Frisullo yanî "birayê xwe" dostên xwe sala 1990´î nas kirine. Ji ber koçberiya Kurdan ya di salên 1990'î de ji bo agahiyan wergirin, gelek caran diçin Romayê, da ku ji Kurdên li wir û buroya Agahdariyê, agahiyan wergirin. Her diçe elaqeya wî, li dijî neheqiyên li Kurdan dibin; ji bo Kurdan, Rêber Ocalan û Kurdistanê zêde dibe. Ew dibêje, "Îro jî li navenda jiyana min û çalakiyên min ên siyasî, ev yek heye."

**Biryardariya wî tesîrê dike**

Zammori dibêje, hem hêza fikra Ocalan û hem jî rêbazên parvekirina van fikran tesîrê li min dike û wiha didomîne: "Di bin şertên dijwar ên tecrîdê yên 23'ê salan de biryardariya nîşan dide gelekî tesîrê dike. Tevî ku di hepsê de bû xebatên nû kirin, kitêbên nû nivîsandin. Timî bû xwedî helwêsteke mînak. Kir ku tiştên ew hildiberîne, miletê wî û mirovên li çar aliyên dinyayê bixwînin."

**Hevdîtina bi Ocalan re ya li Romayê**

Zammori dibêje gava ku Ocalan 12´ê Mijdara 1998´an gihişt Îtalyayê wan xebatên siyasî kirine da ku mafê penaberiya siyasî li Îtalyayê wergire. Hingê ew bi Ocalan re dipeyive jî: Heman salê Kanûnê, li semta Infernetto ya li Romayê min ew dît, pê re peyivîm. Weke doh li bîra min e. Me sohbeteke dirêj kir. Ez lê mikur werim ku ji ber qalibên fikrê yên hingê, ji bo min zehmet bû di wî bigihîjim. Ji ber wê yekê tê bîra min ku min jê xwest bêhtir rave bike û min kir ku çend caran gotinên xwe jî dubare bike. Pêşbîniyên Ocalan ji rewşa tê de pirr zelal bûn. Lewma Ocalan bi awayekî haylêheyî û hesas behsa dengeya hêzê ya di navbera hikûmeta Îtalya û DYE´yê de kiribû. Pirr kêm mirov dikarin di rewşeke ewqasî bi tehlûke de, xwedî kapasîteya tehlîleke bi vî rengî bin."

**Hêza xwe ji Konfederalîzma Demokratîk werdgire**

Zammori dibêje, tevî ku tecrîdkirî ye jî Ocalan xwedî hêzeke tesîrê ya mezin e li seranserê dinyayê û wiha peyivî: "Hêza wî ew e ku fikra Konfederalîzma Demokratîk bi hûrgilî terîf kir û pêk anî. Min ev fikr li cem xwe hem yekser bi çûna Kurdistanê û hem jî bi xwendina weşanên elaqedar kokdar kir. Ji ber ku min dît li wargeha Mexmûrê, li Rojava û Şengalê yekser pêk tê, vê ezmeke mezintir a hizirînê û pêkanînê bi min re çêkir."

***Yenî Ozgur Polîtîka/ REWŞAN DENIZ***



# Helebce komkujiya mirovayiyê ye û komkujî berdewam in

**Komkujiya Helebce yek ji qirkirinên etnîkî yên herî mezin yên sedsala 20'an e ku bi çekên kîmyayî hatine kirin. Piştî Hîroşîma û Nagazakî, Helebce û niha jî li dijî gelê Kurd çekên kîmyayî tê bikaranîn.**

**Mihemed Xanim-Qamişlo**

Dema mirov li dîroka Kurdan dinêre, mirov pir êşeke dibîne ku dagîrkerên Kurdistanê her tişt bi Kurdan kirine. Sala 1988'an li bajarê başûrê Kurdistanê Helebce, rejima Iraqê ya bi serokatiya Sadam Huseyin, 5 hezar Kurd bi gaza jehrê kuştin 35 sal di ser re derbas dibin, lê îro careke din dagîrkeriya tirkî li ber çavê cîhanê dîroka Sedam Huseyin dubare dike û bi gazên jehrê êrişî Herêmên Prastina Mediya dike.

**Erdîngariya Helebce**

Navçeya Helebce ya ji 1599 km. çargoşe rûberan pêk tê, 75 km. dikeve başûrê-rojhilatê Silêmaniyê. Ji nivîs û belgeyên dîrokî diyar dibe ku Helebce gelek caran rastî wêrankariyên xedar hatiye. Cara dawî 1650'yan bajar jinûve tê avakirin û 1889'an diibe navçe. Helebce ji navenda wê û bajarokê Sîrwan, Xurmal û Biyare pêk tê.

**Gavbigav çûna ber bi komkujiyê ve**

16'ê Adara 1988'an 20 balafirên şer yên MIG-23 yên rejima Iraqê çekên kîmyayî bi ser Helebce de barandin. Cara yekê bû ku dewleteke di nava sînorên xwe de çekên kîmyayî dibarandin. Artêşa Iraqê du rojan berî kîmyabaranê, derdora Helebce dabû ber roket û hawanan. Şahidên komkujiyê wiha axivîn: "Bombe bi giranî bi ser navenda navçeyê de dihatin barandin. Ji bo ku ti kes nikaribe derkeve, riyên ketin û derketinê dihatin bombebarankirin."

**Gazên hatî bikaranîn û bandora wan**

Gazên jehrê yên di komlujiyê de hatîn bikaranîn; Sarîn, Tabon û Xerdel (VX)bûn, ku bandora wan li



mejî, hundir, bêhndan û çerm dikir. Kenala BBC ya Birîtanî Kîmyabarana Helebce wiha ragihandibû "Roja Çarşemê zêdetirî 20 balafirên şer ji du aliyan ve bajarê Helebce bombebaran kirin. Piştî bombebaranê ewreke reş, spî û zer wekî bablîsokê bi qasî 50 metrî bilind bû û bêhna gazê ya weke bêhna sîran ji hewayê dihat". Di dîmenên piştî bûyerê hatîn kişandin de tê dîtin ku gelek şêniyên navçeyê li hundir û derveyî malan, li kolanan û hewşên malan ji ber gazên jehrî canê xwe ji dest dane. Hinekan jî hewl daye bi wesatên xwe birevin, lê di nava wesaitan de canê xwe ji dest dane.

**Cangoriyên Komkujiyê**

Di dema bomberana çekên kîmyayî de, li cem şêniyên Helebce derbarê xweparastina ji gazên jehrî de ti agahî nebûn. Herwiha amûrên tenduristiyê jî li ber destê wan nebûn.

Li gorî amarên li ber dest, berî komkujiyê 70 hezar kes li navçeyê dijiyan. Lê nayê zanîn di dema bombebaranê de li navendê jimar çiqas e, lewra berî kîmyabaranê hin derketibûn.

Ti kesî nikariya amarên vê komkujiyê bi temamî eşkere û zelal bike. Lê li gorî amarên hatîn bidestxistin zêdetirî 5 hezar kesî şehîd bûne. Li gorî amarên wê demê, ji sedî 75 ji qurbanan jin û zarok bûne. Herwiha zêdetirî 10 hezar kesî jî birîndar bûn. Piraniya birîndaran jî pişt re ji ber nexweşiya mejî, derûnî, bêhndan, ketina çerm û nexweşiyên cuda giyanê şehîd bûne. Heta niha jî bandora wan gazan li ser nifşên nû dewam dike. Hê jî gelek zarok astengdar ji dayîk dibin.

Piştî kîmyabaranê karesat neqediya. Ne tîmeke pispor, ne saziyeke tenduristiyê hebû ku birîndar serî lê bidin, ne jî derfet hebûn ji bo tedawiyê biçin bajari din. Ji ber wû hinek ji wan mirin, hinek jî nexweşiyên wan bûn şirîkên temenê wan. Piraniya pitikên bêkes li navçeyên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê li navendên zarokên hatin bicîkirin.

**Bêdengî û rûreşiya civaka navneteweyeyî**

Welatên biyanî, rêxistin û civakên navneteweyî li hemberî vê qirkirinê, bêdengî hilbijartin û ti piştgirî jî nedan gel. Lê hin rêxistinên siyasî û civakî yên Kurdistanê, Kurdistaniyên li derveyî welat, bi xebat û çalakiyên xwe raya giştî ya cihanê ji vê qirkirinê agahdar kirin. Sala 2003'yan piştî Iraq ji aliyê Amerîka ve hat dagîrkirin yek ji sûcên sereke ku rejim û serokê wê Sedam pê dihatin sûcdarkirin, Jenosîda Helebce ya berdewama Enfalê bû.

Wek jenosîd nasîna komkujiya Helebce û Enfalê di qada navneteweyî de, ji bo gelê Kurdistanê girîng e. Lewra ji bo zelalkirina komkujiyên sedsala 20'an li her çar parçeyan hatîn serê Kurdan derfetek e.

**Dewleta tirkî li ber çavê cîhanê dîroka Sedam dubare dike û li dijî gel û gerîla çekê kimyayî bi kar tîne**

Dagîrkeriya tirkî jî bi dehê salan e komkujiyên mîna ya Helepce dike.









Ji sala 1986 haya 1999'an, ser 60 hezarî re Kurd kuştine û ser 40 hezar kurdî re jî hatine windakirin. Herwiha nêzîkî 20 hezarî nivîskar û rojnemavan û mirovên navdar yên Kurd hatina kuştin û windakirin.

Dewleta tirkî herwiha di dagîrkirina Efrîn û Serêkaniyê de gaza kimyayî bi kar anî ku ev hat teqezkirin, lê dîsa dewletên cîhanê bêdeng man. Dagîrkeriya tirkî ji 23'yê Nîsana 2021'ê heta niha êrişên ser Herêmên Prastinê yên Medya didomîne; di nava 5 mehan de zêdeyî 250 caran li dijî gerîlayan çekên kîmyayî bi kar anîne. Herwiha welatiyên herêma Berwarî, Bala gundê Hirûrê 2 caran pê bindor bûne. Hikûmeta Iraqê û ya Başûr tevî bangên fermî yên Tevgera Azadiya Kurdistanê û raya giştî ya Kurd li dijî sûcên şer yên dewleta tirkî ti helwest nîşan nedan. Diyar dibe ku ew jî di van sûcan de hevkar in.

## Li Sûriyê divê ji bo yekîtiya demokratîk xebat bê kirin



**Zekî Bedran**

Krîza Ukrayna her ku diçe kûrtir û bandora wê jî pirtir dibe. Rûsya dibêje, Welatê Rojava li hemberî min şerê aborî ragihandine. Amerîka û NATO jî dibêjin em şerê Rûsya nakin, em bikin bibe şerê dinyayê. Wisa xuya dike ku Rûsya herî zê wê bandora ambargoya aborî lê bike. Welatê Rojava jî dixwazin bi ambargoyan lewaz bike. Amerîka û Ewropa dixwazin pitir Rûsya bixin zorê û gavê bi şûn ve pê bidin avêtin.l

Tê gotin, herî zêde wê ev şer bandorê li kîjan welatan bike. Diyar e ku destpêkê welatên nêzîkî Ukrayna û Rûsya yan jî yên alîgirên wan bandor li wan dibe. Bi milyonan mirov bûn koçber û berê xwe dan Polonya û welatên din yên cîran. Ewropa tev jî deriyên xwe ji koçberan re vekin jî niha herî zêde yên mijûl dibin û bibandor dibin cîran Ukrayna ne. Belarûs jî ku li cem Rûsya ye dibe amanca ambargoyan. Welatên nebûyîn amanca ambargoyan lê ji ber têkiliyên xwe yên herî zêde bandor li wan dibe Sûriye û Tirkiye ne. Sûriye jixwe di binê ambargoyan de ye. Lê hem di qada leşkerî hem di qada aborî de ya hêzê zêde piştgiriya Sûriyê dikir Rûsya bû. Rûsya ku di nava şer de ye û bûye amanca ambargoyan weke berê nikara bi Sûriyê re mijûl bibe û destekê bidiyê. Jixwe niha ji Sûriyê alîkariya leşkerî dixwaze. Dibêjin emê ji Sûriyê pazdeh hezar leşkerî bînin. Ev jî tê wateya ku wê Sûriyê tevlî vî şerî bikin. Jixwe li dinyayê ya eşkere destekê dide Rûsya rêveberiya Şamê ye.

Rewşa Tirkiyê mijara nivîseke din e, lê em bi kurtî bêjin ku di aliyê aborî de wê Tirkiye pir bibanbdor bibe. Jixwe rêveberiya Erdogan pir lewaz bûye û ku gotin rast be hatibê sifirê. Ji ber şer bihayê petrolê pir bilez bilind bû. Gelên Tirkiyê eşkere tên şelandin û nikarin nefesê bistînin. Weke din wê ji hatina tûrîstan ya ji Ukrayna û Rûsya mehrûm bimîne. Di şerê li hemberî Kurdan de çavkaniyên Tirkiyê qediyane. Ku bandora vî şerî jî bikeve serê wê rewş xerabtir bibe.

Di rewşa heyê de divê gelên Sûriyê li hemberî êrişên Tirkiyê û planên nû şiyar û amade bin. Lewra rêveberiya Erdoganê faşîst di keysbaziyê de bitecrûbe ye. Pîvanên wî yên mirovî û exlaqî nînin. Sûriye jixwe haiye lewazlirin, Rûsya jî di zorê de ye û bi eniyeke din ve mijûl e. Bêguman niha hesabê emê bikarin hê pirtir destwerdanê li Sûriyê bikin, kirine. Bi taybetî Rojava kiriye amanca xwe. Dihizirin ku Amerîka û Ewropa bi Ukrayna ve mijûl in. Weke din pêdiviya wan bi min heye, dibe ku ew jî destûra êrişa ser Kurdan bidin, wê bêdeng bimînin. Jixwe ji bo êrişên zêde yên ser başûrê Kurdistanê amadekariyê dikin. Di vê navê de Barzaniyan her tim dibe cem xwe û planên hevbeş çêdikin. Jixwe ji bo êrişa ser Başûr desteka Amerîka û NATO heye.

Tirkiye bixwaze wê li Idlibê jî eniyekê veke. Jixwe El Nusra û rêxistinên din di binê parastin û kontrola wê de ne. Amerîka û Ewropa jî ji bo tiştek e wisa dengê xwe nakin. Heta wê destek bikin. Lê dibe ku niha nexwazin. Piştî ku Rûsya lewaz bikin wê bixin rojeva xwe.

Wê Rûsya alîkariya dida Sûriyê kêm bike. Lîreyê Sûriyê li hemberî dolar her ku diçe kêmtir dibe. Gel di nava xizanî û tinebûneke mezin de ye. Li Sûriyeke ku wêran bûye, nikare yekîtiya xwe pêk bîne û di warê aborî de roxiyaye, rêveberiya Şamê çi tedbîran digire. Li ber çavan tişteke ku hêviyê bide xuya nake. Halbiku diviya rêveberiya Şamê herî zêde berjewendiya gelê xwe û yekîtiya wî li ber çavan bigirta. Çavkaniya bingehî ya hêzê gel e. Lê yên li Şamê rûdinin dixebitin ka wê çara otorîteya navendî saz bikin û desthilatiya xw bi ser welatiyan de bisepînin. Daxwaziyên gel û yekîtiya demorkatîk qebûl nakin û xeter dibînin. Ev jî dibe sedem ku piraniya gel ji rêveberiya Şamê dûr bikeve. Çawa ku tiştek nebûbe Rêveberî dixwaze her tişte bibe weke berî 2011an. Wê rêvebriya Şamê heta kengê xwe bispêre Îran û Rûsya?

Bi alîkariya wan li ser piyan me. Ji bo yekbûna welatê xwe, yan ji bo serdestkirina desthilatiya xwe wê vê destekê bi kar bîne? Wê roj were piştgiriya derve qur bibe û hevsengî bên guhertin. Ji bo ku rêveberiyek nekeve valayiyê divê pişta xwe bide hêza gelê xwe. Ji bo wê, di serî de gelên bakur-rojhilatê sûriyê, bi Rêveberiya Xweser re li hev were û bi avêtina gavên demokratîk, baweriyê bide derdotên din jî û qada jiyanê veke. Divê xwe bispêre pîvana 'Eger tu dixwazî bijî bide jiandin'. Perçiqandin û bindestkirin her dem encameke baş nade. Eger gel zana bûbe û xwe bi rêxistin kiribe, wê ew sepandin bi şûn ve vegerin. Sûriye hê di rewşeke zor û krîtîk de ye. Di çareseriya pirsgirêkê de herî zêde berpirsiyarî dikeve ser milê rêveberiya Şamê.